Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1096 | 3-Îlon- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Bi kemanê bersiva dagirkeran dide

Romîna Sîdo ya 20 salî yek ji jinên ciwan a Efrînê ye ku di temenê xwe yê ciwan de bû şahida êrişên dagirkeriyê ya dewleta Tirk li ser Efrînê. Romîda Sîdo niha di xebatên Hîlala Zêrîn de bi çand û hunerê têdikoşe, piştî 2018'an ji ber êriş û dagirkeriya dewleta Tirk neçar ma tevî malbata xwe koçî Şehbayê bibe, bi hunera xwe û kemana ku lê dide bêrîkirinên xwe yê li hemberî Efrînê vedibêje.



Romîda Sîdo der barê xebatên xwe yên çand û hunerê de got: "Di zaroktiya xwe de li navçeya Cindirêsê li kantona Efrînê ya niha hatiye dagirkirin, ez tevlî komên zarokan bûm, mamosteyê me ji bo kêrhatiyên me bişopîne û em xwe îsbat bikin em birin Înstîtûya Çandê li Efrînê."

### Perwerdeya wê nîvco dimîne

Romîda Sîdo anî ziman ku piştî ketina nav xebatên çandê ew xwestiye li kemanê bide û wiha domand:"Derdorî salek û nîvekê ez li înstîtûya muzîkê li Efrînê perwerde dibûm, ew dem derfet çênebû ku pispor bim. Ji ber bombebarana dewleta Tirk û çeteyên wê em penaberî kantona Şehba bûn. Ji lewma jî perwerdeya min ya muzîkê nîvco ma."

### Penaberî nebû astengî

Romîda Sîdo ya mîna bi hezaran ciwan rastiya êriş û dagirkeriya li ser cih û warên xwe dibîne, li ser pêvajoya penaberiyê jî got: "Penabertî ji bo me ne hêsan bû lê li pêş vîna me nebû astengî, me kêrhatî û çanda xwe parast. Lewra komek keçên ciwan ên min li Efrînê nasdikirin û hin keçên ji gundê me komeke ava kirin û em bi hevre kemanê dijenînin."

Romîda Sîdo anî ziman ku bi hatina wan a Şehbayê re ji ber nebûna mamosteyên muzîkê rastî hîn astengiyan hatine, lê piştî ku koma wan hat avakirin êdî van astengiyan jî ew bi xwe derbaskirine.

### Hêvî ji bo rizgarbûna Efrînê

Romîda Sîdo ya bi avakirina Hîlala Zerîn re êdî destpê dike ku kemanê fêr bike û got: "Ez nikarim bêjim ez pir profesyonel im lê her tiştê ez dizanim ez fêrî kesên dîtir dikim. Dema ew derdikevê ser dikê li şahiyan û şevbihûrkên hunerî hêz û coşeke zêde ji gel werdigire bi vîneke hêzdartir berdewam dike."

Di dawiya axaftina xwe de Romîna Sîdo hêviya xwe ji bo rizgariya Efrînê û vegera Efrînê tîne ziman ji bo bibe mamoste û orkestra taybet û her wiha înstîtûyeke muzîkê ji bo zarokan jî veke.

# Bihişta xemilandî

**Zozanên Balekayetî mîna bûka xemilandî ya Kurdistanê ye. Her çar demsal lê tê jiyankirin. Di nava dîmenên wê yên ciwan de Şikefta Zêrîn Xan a dikeve raserî gola efsûnewî ya Bin Lîs bûye cihekê geştiyariyê.**



Çiyayê Zêrîn Xan a li sinorê Balekayetî ya bi ser parêzgeha Hewlêrê, dikeve ser sêgoşeya Başûr, Bakur û Rojhilatê Kurdistanê. Li quntara çiyê şikeftek mezin a xwezayî lê heye û hejmarek zêde geştiyar serdana wê dikin.

Tişta ku dihêle zêdetir dîmenê şikeftê xweşik diyar bibe, gola efsûnî ya bi navê Goma Bin Lîse. Geştiyar û pispor li ser wê yekê hemfikirin ku ew şikeft şikefta herî bilind û dirêj ya Başûrê Kurdistan û Iraqê ye.

### bilind bûna Şikefta Zêrîn 61 metre

Huner Rehman yek ji çiyagerên devera Balekayetiye,wiha got: "Şikefta Zêrîn Xan û Goma Bin Lîs dikeve naverasta her du lûtkeyên çiyayê Çîxe Derê û Çiyayê Helgurd ku du çiyayên herî bilind ên Başûrê Kurdistan û Iraqê ne. Ev cih bûye navendek ya geştiyarî û çiyageran. Goma Bin Lîs dikeve li ber derê Şikefta Zêrîn Xan û her çar demsalan berf, şînkayî û gelek cûrên gulan lê tê dîtin. Çiyagerê bi navê Çiya Siyamend jî li ser ciwaniya xwezaya deverê axivî û got: "Tevî ku rêya maşîneyan nayê vir, lê bi berdewam çiyager serdana vir dikin û lê dimînin. Dirêjiya Şikefta Zêrîn Xan 61 metreye, firehiya wê li hinek cihan ji pênc metreyan zêdetire. Bilindiya wê çar metre û li hinek cihan jî metreyeke. Her ku mirov dikeve kûrahiya şikeftê nizimtir dibe, dawiya şikeftê digihe metreyek. Pileya germahiyê di astek gelek nizim de ye. Di demsala havînê de di nava rojê de pileya germahiyê da dikeve qasî 10 pleyan. Mayîna di şikeftê de zehmete." Hêjayî bibîrxistinê ye Şikefta Zêrîn Xan li cihekî ku zêdetirî 3100 metreyan ji asta deryayê bilindtir e. Li ser asta Herêma Kurdistan û Iraqê şikefta herî mezine.

Sudoku: Bersiv 6

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | 1 | 3 | 5 | 8 | 9 | 2 | 4 | 7 |
| 5 | 4 | 2 | 7 | 1 | 3 | 9 | 8 | 6 |
| 7 | 8 | 9 | 2 | 4 | 6 | 5 | 1 | 3 |
| 4 | 3 | 8 | 9 | 2 | 7 | 6 | 5 | 1 |
| 2 | 7 | 6 | 4 | 5 | 1 | 8 | 3 | 9 |
| 9 | 5 | 1 | 6 | 3 | 8 | 4 | 7 | 2 |
| 1 | 6 | 5 | 8 | 7 | 2 | 3 | 9 | 4 |
| 8 | 9 | 7 | 3 | 6 | 4 | 1 | 2 | 5 |
| 3 | 2 | 4 | 1 | 9 | 5 | 7 | 6 | 8 |

Sudoku:Pirs 7

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | 6 | | | 7 | | | |
| | 7 | | 6 | | | 8 | 1 | |
| | | 8 | 9 | | 5 | | | 3 |
| 8 | | 5 | | | 3 | | | |
| | 1 | | | | | | 8 | |
| | | | 5 | | | 7 | | 9 |
| 5 | | | 1 | | 9 | 3 | | |
| | 3 | 9 | | | 2 | | 5 | |
| | | | 3 | | | 2 | | 6 |

# Pîrtirîn hunermenda kolanan

Grace Brett sala 2014´an 104 salî bû û ji ber ku ev jina Skoçî hingê endama komeke "gerîlayên hunerê hûnandinê" bû, bûbû hunermenda herî pîr a hunerê kolanan. Ew serokê komeleya hunandinê ya bi navê Strick-Clubs Souter Stormers bû û wê bajarê xwe Borders, bajarên cîran ên weke Selkirk û Yarrow jî û heta bi Edinburgh jî bi neqşên xwe yên hunandî dixemilandin.

Li ser saxî û nesaxiya wê îro nûçe nehatibin belavkirin, em dizanin ku ew êdî ne çalak e.

Grace Brett a ku heta herî kêm 104 saliya xwe hunerê xwe dewam kir, sala 2014´an ji çapemeniyê re gotibû, "Ez hizirîm ku bi rastî jî fikreke baş e ku ez bajêr bixemilînim û bextewer bûm ku neqşên min ên hûnandî jî bi kêra wê hatin. Kêfa min hat ku berhemên min hatin nîşandan û min got, bajar jî xweşkok bû." Keça wê ya hingê 74 salî jî got, "Wê tevahiya jiyana xwe, timî hûnand û neqşên tenteneyan jî çêkirin. Ji bo zarok û pitikan çi lazim bû wê hûnand, destmalên sermilkan çêkirin." Ev jî ne hindikin, lewma 6 zarokên keça wê Daphne û 14 jî neviyên wê hene. Keîa wê hingê ji rojnameyan re gotibû, "Dayika min difikire ku têra xwe komîk û xweş e ku ji mirov re bibêjin hunermenda kolanan."

Wê li bajarê xwe Borders 46 nîşan bi neqşên xwe xemilandin. Ew sala 1910´an hatiye dinê.






# FERHENGA BIWÊJAN

**Xwe avêtiyê:**
- Li ber geriya; doza lêborînê lê kir; lava jê kir.

**Xwe avêt koşa wî:**
- Bi heman wateyê.

**Xwe avêt ber bextê wî:**
- Ji bo ku biparêze hêvî jê kir.
- Ji bo alîkariyê hêvî jê kir.

**Xwe avêt ber dergehê wî:**
- Doza lêborînê lê kir.

**Xwe avêt himbêza wî:**
- Ji bo ku biparêze hêvî jê kir; xwe avêt ber bextê wî.

**Xwe avêt ser bextê wî:**
- Bi heman wateyê.

**Xwe avêt mala wî:**
- Doza lêborînê lê kir.

**Xwe avêt piştê:**
- Ji bo ku biparêze hêvî û rica jê kirin; xwe avêt ber bextê wî.

**Xwe avêt pişt dergûşa wî:**
- Doza lêborînê lê kir.

**Xwe avêt pişt landika wî:**
-Bi heman wateyê.

**Xwe avêt ser destê wî:**
- Doza lêborînê lê kir; li ber geriya; lava jê kir.

**Xwe avêt ber şêmûga (derîzan, derçik) wî:**
- Bi heman wateyê.

Xwe avêt ber destê wî
- Xwest sûcên xwe bide efûkirin.

**Xwe avêt hêşa wî:**
- Bi heman wateyê.

**Xwe avêt hêşeta wî:**
- Bi heman wateyê.

**Xwe avêt dawa wî:**
- Bi heman wateyê.

**Xwe avêt lingê wî:**
- Bi heman wateyê.

**Xwe avêt ser doşeka wî:**
- Doza lêborînê lê kir; got min bibexşîne.

### LI SER FEQÎRÎ Û XIZANIYÊ

Agir bi dinyayê bikeve baqek pûşê **wî tê de nîne:**
- Pir xizan e; tiştekî wî nîne.

**Avêtiye qula paşî:**
-Bi heman wateyê.

**Barê xwe li tajiyê kir:**
- Tiştekî wî nema; ziyaneke mezin gihatiyê.

**Barê xwe li pisîkê kir:**
-Bi heman wateyê.

**Bexçika xwe da hev:**
- Xizan bû; tiştekî wî nebû; tiştên wî tev diketin nava bexçikekê.

**Bêhn ji devê wî tê:**
- Pir xizan e; tiştekî wî nîne.

**Bêhn ji qirika wî tê:**
-Bi heman wateyê.

Bêş hat ser maldaran, avetin ser feqîr û jaran.
- Ceza ji dewlemendan re jî were, wê xizan ceza bixwin; tim xizan zererê dibînin

Bêş/cirm: Standina diravan bi darê zorê.

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1096 | 3-Îlon- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# QSD'Ê HÊVIYA HEMÛ GELÊN BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRIYÊ YE

Fermandariya QSD'ê diyar kir ku tu nakokiya wan bi gelê Dêrazorê re tune ye, lê şerê niha li herêmê rû dide bi çeteyên dewleta Tirk a dagirker û endamên girêdayî hikumeta Şamê re ye. Herweha banga me ji gelê me yê Dêrazorê û tevahî gelên herêmê re ew e, ku neyên lîstok û fitneyan. Hêzên Sûriya Demokratîk hêza parastina tevahî gelên herêmê ye.**R-3**




## 'Ragihandina jin dengê berxwedan û heqîqetê ye'



Rojnamevanên jin yên bakur û rojhilatê Sûriyê diyar kirin ku ji destpêka şoreşa Rojava ve, jin di pêşxistina qada çapemeniyê de xwedî rolek seker bû û li hemberî êrîşên dagirkeriyê yên ser herêmê bû dengê berexwedan û heqîqetê.**R-2**

## 'Divê Rêxistinên navneteweyî li hemberî tecrîdê bêdeng nemînin'



Dewleta Tirk a fşîst bi ferzkirina Tecrîda girankirî ya ku li ser Rêber Apo tevhiay pîvan û zagonên mafê mirovan bi pê dike. Parêzer Cibraîl Mistefa diyar kir ku li hemberî sûcê tecrîdê, divê rêxistin û saziyên navneteweyî bi erka xwe ya exlaqî rabin û helwsta xwe nîşan bidin.**R-5**

## PDK`ê çavkaniya xiyanetê ye



Ev 27 sal di ser xiyaneta Partiya Demokrata Kurdistanê re derbas bû, ku PDK`ê bi hevkariya artêşa rejîma Baas a Iraqê bi tangan êrişî Parlamentoya Herêma Kurdistanê kirin.**R-4**

## Çand nasnameya gelan e



Her herêmek bi çanda xwe ya resen tê naskirin û weke nasnameya civakê tê destgirtin. Gelê herêma Şehbayê jî çanda xwe ya resen parastine. Hevserokê desteya Çand û Hunerê ya herêma Şehba û Efrînê Mihemed Wês destnîşan kir ku bi tevlîbûna me ji nava Rêveberiya Xweser re me karî çanda xwe ji derdor re pêşkêş bikin.**R-7**

## Dara Jiyanê

Peykersaz û serokê Komeleya Art'Situ "Pascal Bejeannin" ku ji Fransayê berê xwe da Rojavayê Kurdistanê ji bo pêkanîna projeya "Dara Jiyanê" ku dixwaze bi riya vê yekê bal bikşîne ser fedakarî û lehengiya keç û xortên Rojava yên ku li hemberî dagirkeriyê her tim di nava berxwedanê de ne û ji bona azadiyê cane xwe feda dikin.**R-7**



Zozan Ciziri
**TALANA XWEZAYÊ**
*R-2*



Idrîs Henan
**QSD`ê gerantorê aramî û aşitiya herêmî ye**
*R-5*

# ‘Ragihandina jin dengê berxwedan û heqîqetê ye’

Rojnamevanên jin yên bakur û rojhilatê Sûriyê diyar kirin ku ji destpêka şoreşa Rojava ve, jin di pêşxistina qada çapemeniyê de xwedî rolek seker bû û li hemberî êrîşên dagirkeriyê yên ser herêmê bû dengê berexwedan û heqîqetê.

**Birûc Resûl/Qamişlo**



Jiyan Bîlgîn



Raperîn Elî



Sûzan Elî

Bi şoreşa Rojava re gelên herêmê di tevahiya aliyan gelek destkeftî bi dest xistin, bi taybetî jina kurd cihê di hemû qadên şoreşê de girt û jinên cîhanê re bû mînaka berxwedan û têkoşînê. Yek ji qadên herî girîng ku jina kurd tê de pêşengtî kir qada çapameniyê bû. Jinên rojnemevan ji destpêka şoreşa Rojvava kêlî bi kêlî berxwedan û têkoşîna heyî ji tevahiya cîhanê re radigihand û bû dengê berxwedana şoreşê. Lewra herdem dibû hedefa êrîşên dewleta Tirk a dagirker. Jina Rojnemevan bi pênûs û kamîreya xwe tirs xistiye dilê dagirker û dijminê gelê Kurd.
Derbarê rola ragehandina jin li bakur û rojhilatê Sûriyê, rojnemavanên jin yên bakur û rojhilatê Suriyê ji rojnemeya me re axivîn.

**‘Di pêşxistina civakê de rola jinê sereke ye’**

Rojnemevana Kenala Ronahî TV Raperîn Elî diyar kir ku jinên kurd di dirêjahiya dîrokê xwedî têkoşîneke mezinin û wiha got: “Gava mirov girêdana ragehandin û jinê binirxîne, divê mirov nas bike li ser çi bingehê hatiye avakirin heta ku gihiştiye qonaxa îro ku weşangeriyek bi deng û rengê jinê derketiye holê. Bê gûman bi salan li tevahiya kurdistanê zext û zordarî li ser jinan hatiye meşandin. Ji ber ku di nava civaka kurd de jin xwedî roleke sereke ne, jin herdem hatine hedefgirtin, herwiha ji aliyê civakê ve jî, ji gelek mafê xwe bê par maye. Jinên kurd di dirêjahiya dîrokê de teslîmkarî qebûl nekirin e û xwedî têkoşîneke mezinin. Herwiha berdêlên gelek buha jî dane heta ku gihiştine vê astê.”

**‘Di qada ragehandinê de rengê jinê derket pêş’**

Raperîn wiha berdewamî da axaftina xwe û got: “Di qada ragehandinê de herdem jin bêpar û mehrûm bûn, lê piştî derketina Tevgera Azdaiya Kurdistanê ku ji bo jinan bû şoreşa vejînê, jinên kurd gelek gavên girîng avêtin, jin bûn xwedî artêş û mîrasa têkoşînê, cara yekemîn bû ku di nava ragehandinê de rengê jinê hat dîtin û weşangerî bi deng, heqîqet û rastiya jinê dest pê kir. Bi 10’an jinên têkoşer yên di çapemeniyê de cihê xwe girtin, barekî giran hildan ser milê xwe. Herwiha bûn bersiv ji êş û heqîqeta gelê xwe re, bûn bersiv ji êrîşên ser jinên kurd û mîrasek dan avakirin, ji bo me jî ev jin bûn cihê ilham û têkoşînê. Ji destpêka şoreşa Rojavayê Kurdistanê ve, qada ragehandinê ji bo jinên Rojava qadeke nû bû, herwiha di qada ragehandinê de jî şoreşek hat avakirin, ji ber ku gelekî zehmt bû di nava civakeke ewqas girtî de tu dengê jina ragehîne.”
Raperîn da zanîn ku jinên rojnemevan tevî hemû zehmetiyan jî, bûn dengê heqîqetê û wiha domand: “Bi şoreşê re me xwest ku em bibin dengê rastiyê, li tişta zehmet jî ew bû ku jinan nikarîbûn derkevin û êşên xwe bêjin, ji ber ku bi 10’ê salan şidet li ser wan hatiye meşandin. Lê bi kar û xebatan û piştî demekê me hişt ku zimanê jinê bê vekirin û êşên xwe bêjin. Ev jî bi saya rojnamegeriya jin bû, me xwest em di riya çapemeniyê de rastiya jinê di tevahiya milan de derxin holê. Ragehandina jin di tevahiya qadan de bû deng û rengê şoreşê.”

**‘Jinên rojnemevan bûn xwedî sîwan’**

Rojnemevana Kenala Ronahî TV Raperîn Elî axaftina xwe wiha bi dawî kir û got: “Piştî xebateke dirêj, di sala 2020’an de, yekem car li herêmên bakur û rojhilata Sûriyê, Yekîtiya Ragehandina Jin hat damezrandin, îro di bin sîwana wê de, jinên rojnemevan di hemû destgehên ragehandinê de, maf û hebûna wan tê parastin, jinên rojnemevan bûn xwedî sîwan, dikarîbû gelek tiştan belge bikin , bi taybet kiriyar û êrîşên dagirkeriy, jinên rojnemevan bi îrdeyeke xurt û bê tirs bûn bersiv. Dewleta Tirk bi gelek rêbazan êrîşî herêmê dike, erka sereke ku jinan girt ser milî xwe, sekina li hemberî tevahiya plan û êrîşên dagirkeriyê bû. Divê rojnemevanên me yên jin di tevahiya aliyan de xwedî zanîn û têgihiştin bin, her wiha li ser fedekarî û heskirina welat, xwe pêş bixin.”

**‘Bi pênûsa jinan Şoreş tê nivîsandin’**

Di heman çarçoveyê de rojnemevana Ajansa ANHA ’yê Cîhan Bîlgîn balkişand ser girîngiya ragehandinê ji bo gihandina heqîqetê û wiha got: “Ragehandin bûye bingeheke asasî di jiyana mirovan de, dewlet ji bo astengkirina derxistina heqîqetî, bi taybet sûc û kiryarên ku tên kirin, li hemeberî ragehandina rast disekinin û wê dike hedef. Jin di dîrokê de û heta niha bê maf hatiye hiştin, herdem êrîş li ser hatiye kirin, ji bo rakirina tola xwe jinê cihê xwe di ragehandinê de girtiye. Jinê bi pênûsa xwe rastî û heqîqet ji civakê radighîne û dîrokê dinivîsin, bi taybet di şoreşa Rojava de, sekina jinan gelekî girînge bû , şoreşa jinan ku bi pênûsa jinan bê nivîsandin, ev bi xwe rakirina tola jinê ye û li hemberî êrşê li ser jinê bersive.”

**‘Tevî êrîşan jî jinan tu gav bi paşve neavêtin’**

Cîhan da zanîn ku ji sala 2013`an heta niha 27 rojnemevan şehîd bûne û wiha pê da çû: “Piştî dagirkirina xaka Sûriyê, dewleta Tirk a dagirker bi awayekî eşkere êrşî gel, herwiha êrîşî rojnemevanan kir, armanca dagirkeriyê ji hedefgirtina ragehandinê jî, veşartina rastiya kiriyarên dijmirovî ye. Tevî hemû êrîşan jî, ragehandina azad tu gav bi paşve neavêtin. Beriya çend rojan di êrîşa dewleta Tirk a dagirker de, kedkarekî JIN TV şehîd bû, û rojnemevan Delîla Egîd birîndar bû, tevî van êrîşan jî rojnemevan bi îradeyeke xurt, kar û xebatên xwe dewam dikin.”
Rojnemevana Ajansa ANHA’yê Cîhan Bîlgîn wiha axaftina xwe bi dawî kir û got: “Tevî hemû zehmetiyan jî, heta niha em bi bîr û baweriyê gavan bi paş ve naevêjin, li aliyekî din tevî hemû êrîşan jî, tevahiya cîhan bê denge û tu helwestê nîşan nade, ew kesên dibêjin ku em parastina mafê rojnemevanan dikin, li hemberî hedfgirtina rojnemevanan bê dengin û çavên xwe digrin, ev jî tê wateya hevkariya êrîşan.”

**‘Tekoşîna jina kurd li hemberî ‘zihniyeta baviksalarî ye’**

Derbarê heman mijarê Edîtora giştî ya Rojnemeya Ronahî Sûzan Elî destnîşan kir ku jina Kurd li hemberî kevneşopiyên civakê û zihniyeta desthilatdar ‘zihniyeta baviksalarî’ bû dengê jina têkoşer û wiha domand: “Bê guman dema tê gotin jin û ragihandin yan jî jinên rojnamevan, tê bala mirov hêz û bawerî, ji ber ku ragihandin kesek pir bi hêz dixwaze da ku tev bigere. Îro em vî tiştî li cem jinên rojnemevan li bakur û rojhilatê Suryê dibînin. Berî şoreşa 19`ê Tîrmehê jin nikarîbûn cihê xwe di ragihandinê de bigre, beşê ragihandinê li bakur û rojhilatê Suryê tevahî tune bû, her wiha sîstemên desthilatdar ragihandin kiribûn di bin xizmeta xwe de. Em dikarin bêjin ku ragihandin tênê ya dewletê bû. Lê piştî şoreşa 19`ê Tîrmehê ya ku tê naskirin bi şoreşa jin, ragihandina civakê yan jî ragihandina azad hat avakirin wekî berhemek vê şoreşê bû, jin jî bitaybetî jina Kurd li hemberî kevneşopiyên civakê û zihniyeta desthilatdar ‘zihniyeta baviksalarî’ gelek têkoşîn kir. Da ku dengê şoreşê û rastiya heyî ji bo raya giştî ragihîne.”
Sûzan da xuykirin ku pêwîste rojnemevan xwedî armanc be û wiha got: “Jin di ragihandinê de roleke serek dileyze û gelek astengiyan derbas dike, herwiha da ku bighêje armanca xwe, têkoşîn dike. Ragihandin qadeke îdeolojîke û cihê berpirsiyariyê ye, her wiha taybetmendiyên kesên rojnamevan cûda ne. Rojnamevan gerek zanyar be, dîrok nasbe, rewşenbîr be û siyaset medar be, gerek xwedî armanc be, nirxên civaka xwe biparêze, xwedî doz be û di heman demê de fedekar be. Em dizanin ku jin pêşenga civakê ye û ev pêşengtî pir pêwiste di qada radihandinê, ragihandina jin re w e ku kar û xebatê xwe baş bike û nameya xwe durust bide. Destpêkê gerek jin xwe nas bike, armanca xwe diyar bike, dîroka jin nas bike, gerek xwe lêpirsîn bike, ez kî me, ez çi dixwazim, ez bi ku ve diçim?. Piştre jî pêwîste lêkolîn bike û bixwîne, her wiha têkeve ferq û cûdahiya xebatê ragihandinê ji karên din re. Berî her tiştî ji xwe û ji doza xwe bawer be.”

**‘Jin rojnemevan çavê rastiyê ne’**

Edîtora giştî ya Rojnemeya Ronahî Sûzan Elî di dawiya axaftina xwe da zanîn ku ragihandin li bakur û rojhilatê Sûryê çavê rastiyê ye û got: “Ragihandin hişmendiya civakê ronî dike, kiryarên desthilatdariyê teşhîr dike û dighîne raya giştî, diheman demê de ramanê azad fikrê netewa demokratîk belav dike, ev jî dibe sedem ku tên hedefgirtin, bitaybetî jinên rojnamevan, ji ber ku hem jine û hem jî rojnamevane. Her wiha sîstemên desthilatdar pir ji hêza jînê ditirsin, dizanin ku jina bi hêz a azad, bi rêxistin civakekê bi xwe re ava dike. Ez jî wek jineke rojnamevan, em li ser riya şehîdên rastiyê dimeşin û xeta ragihandina azad dişopînin. Erkê xwe heya dawî pêkbînin, ku kiriyarên dagirker û desthilatdaran red û teşhîr dikin. Em bang civaka navnetewî dikin, ku balfirên bê mirov li ser esîmanê bakur û rojhilatê Suryê qedexe bike, rastiya dewleta tirk a dagirker bibîne û wê ji erda me derxe.”

**Ramangeh**

## TALANA XWEZAYÊ

**Zozan Cizîrî**

Li nav giştî cîhanê, me ji nav hemû salan havîneke pileya germahiya xwe di asta herî bilind de jiyan kir û em hîna jiyan dikin. Saziyên meteorolojiyê yên dewletan rojane nûçeyên dijwarbûna germahiyê, xeteriyên vê yên li ser jiyana mirov û jîngehê diweşînin. Gelek rojan têkildarî vê germahiya dijwar nûçeyên felaketê yên digotin, “rojên herî germ ên havîna 2023’yê rekor li ser rekorê dişkînin”, nizanim “li Amerîka û Hindîstanê ji ber hewaya germ ji 100’î zêdetir însanan jiyana xwe ji dest dan” û hwd. dihatin weşandin. Lê ya herî balkêş û hêjayî nirxandinê; wekî ev germa dijwar rewşeke normal û xwezayî be empozeyê mêjiyê civakê kirin û tu reflekseke dijber, lêpirsîner çênabe!
Li gor teoriya kaosê zanyar Edward Norton Lorenz tespîtek wiha dike; “Ger li Amazonan pepûleyek perê xwe bihejîne, ew bayê perê pepûle li Amerîka dibe sedem ku bahoz rabe”. Vêca germahiya îsal a bû sedema mirina sedan mirovan û havîn li me kir jehr, pêwîste tenê wek rewşeke xwezayî neyê nirxandin. Eger em li gor bandora pepûleyê bigirin dest, ev tê wateya ku di destpêka sîstemê de guhertinên cidî û destkariyek mezin li ser xwezayê kirine.
Bi taybet li Kurdistanê îro hukûmeta AKP’ê ya diz û çavbirçî bi siyaseta dijminane tenê êrîşî civaka Kurd nake, her wisa êrîşî xwezaya Kurdistanê jî dike. Vê dema nêz roj nîn e çend nûçeyên ku artêşa Tirk a dagirker agir berdide çiyayên me, li ser çiyayên me teknîka şer a herî bilind û gazên jehrî yên qedexekirî li hember gerîla bikar tîne û hwd. di çapemeniya azad de dernekeve. Dewleta Tirk a li hemberî berxwedana gerîla ya serkeftî bêçare mayî, vê carê jî lez dide sazkirina bendên avê. Piştî bendava Hesenkêfê, dewlet niha jî amadekarî dike bendaveke mezin li ser Çemê Dîcle ava bike. Jixwe zirara her bendaveke dewletê dide xweza û jîngehê tê zanîn. Her bendavek li şûn xwe çolistaneke hişk û rût dihêle. Têkçûna her daristanekê li gel însan jiyana hemû zindiyan dixe xeteriyê…
Li pêşber van kiryarên xeternak mixabin rexmê îro di cîhanê de bi sedan saziyên jîngehparêz hene jî, tu kesek li hember van kiryarên dewleta Tirk a dagirker û talanker dengê xwe dernaxe. Di dema xwe de helbestvan û zanayên civakê yên wek Ahmed Arif bi ristên,
“Vana, maregîsk û maşot in
Vana, yên çav berdane nanê me, aşê me ne,
Vana nas bike, nas bike û mezin bibe…” heqîqeta sîstema desthilatdar a kedxwar û talanker radixistin pêş çavan, hestên mirovahiyê şiyar dikirin. Divê em baş bizanin ku ev germahiya îsal a dijwar ji wê şewitandina daristanan a bi destê artêşa Tirk, ji wan bombebaran û kîmyabaranên li ser gerîlayên azadiya Kurdistanê, ji avakirina van sed û bendavan qut nîn e, qet jixweber nîn e. Eger em naxwazin roja me ya îro bibe dojeh û pêşeroja me bê jehrîkirin, helwesta herî birûmet em demildest li dijî vê talan û birîndarkirina xwezaya Kurdistanê rawestin û mil bidin milê gerîlayên parêzvanên rûmetê.



# Çand nasnameya gelan e

Her herêmek bi çanda xwe ya resen tê naskirin û weke nasnameya civakê tê destgirtin. Gelê herêma Şehbayê jî çanda xwe ya resen parastîne. Hevserokê desteya Çand û Hunerê ya herêma Şehba û Efrînê Mihemed Wês destnîşan kir ku bi tevlîbûna me ji nava Rêveberiya Xweser re me karî çanda xwe ji derdor re pêşkêş bikin.

**Zana Roj/ Şehba**

Herêma Şehbayê di aliyê cografî de li aliyê Başûrê Bajarê Helebê dikeve û weke gundewarên Bajarê Helebê tê naskirin. Herêma Şehbayê piştî aloziya Sûriyê di 2011 an de dest pê kir. Weke herêmeke ji Sûriyê rastî gelek êrîş û talan kirinan hat. DAIŞ û komên çeteyan yên opozisyonê xwe tê de birêxistin kirin û demeke dirêj bibû navenda şerê di navbera artêşa Sûriyê û komên çeteyan de. Gelê resen yên herêmê rastî gelek sûc û binpêkirinan hatin. Jinên wan hatin revandin, kuştin, talankirin, binpêkirinên dij mirovî li ser wan hatin meşandin. Herî dawî herêma Şehbayê ji aliyê hêzên YPG, YPJ ê ve hat rizgar kirin. Hêjayî bîranînê ye ku di Şehbayê de gelek pêkhate bi hevdûre jiyan dikin, Ereb, Kurd û Turkmen bi çanda xwe weke netewekî jiyan dikin. Di vê mijarê de me xwest em bal bikşînin ser çand û hunera resen ya herêma Şehbayê. Têkildarî vê mijarê Hevserokê Desteya Çand û Hunerê ya herêma Şehba û Efrîn Mihemed Wês ji rojnameya me re axivî.



**“Dewlet pişaftina çandê pêktîne”**

Mihemed di destpêka axaftina xwe de anî ziman ku avakirina dewletan re çanda gelan û pirbûna çandan ji holê hatin rakirin û hikumeta şamê jî ev yek pêk anî:”Çand nirxê gelan temsîl dike, li ser wan nirxan nifiş tên mezinkirin da ku çanda resen a civakê neyê pişaftin. Lê belê bi avakirina sîstema dewletan re destdirêjî li vê yekê hat kirin û xwestin her tiştî di bin navê yek netewê de bidin nîşandan. Sîstema dewletan li tavahî cîhanê pirbûna rengan ji ziman, çand, pêkhate û nasname ji holê rakirin, bi demê re piraniya çandan hatin helandin û li gor berjewendiyên xwe civak mezin kirin. Dewleta Sûriyê jî ji van siyasetan ne dûr e, bi avakirina dewleta Sûriyê re hemû çandên ku di Sûriyê de dihatin jiyan kirin xwestin bidin helandin û tenê yek ziman, yek Al, yek Nasname ferz bikin. Di encama van siyasetan de ew zengînbûna çandên heyî ji Ziman, guvend, Filklor, Kultûr û hwd bi awayekî veşartî ji bo parastina nirxên bav û kalan hatin jiyan kirin”.

**“Herêma Şehbayê mûzayîka çanda ye”**

Mihemed di axaftina xwe de xuya kirin ku rengê çanda Erebî li pêşe û wiha got: “Herêma Şehbayê bi hebûna gelek ziman, çandan û pêkhateyan tê naskirin. Ji kevin de di herêma Şehbayê de pêkhateya Kurd, Ereb û Turkmen tê de jiyan dikin. Lê belê pirbûna van pêkhateyan di bin yek rengî de ew jî rengê çanda Ereban de dihatin nas kirin û heyanî niha jî wisa ye. Gelek gundê Şehba Kurd û Turkmen in, her du Pêkhateyan jî heyanî astekê zimanê xwe yê resen parastine û di nava mal de bi Kurdî yan Tirkî diaxivin, lê belê di aliyê ku ev yek demdirêj bê parastin pir zêde nebû û zimanê Erebî weke zimanekî esasî hat destgirtin”.

**“Çanda demukratîk bi Netewa Demukratîk pêkan e”**

Mihemed anî ziman ku piştî 2017 an bi rizgarkirina herêmê ji komên çeteyan her tişt hat guhartin û wiha domand:”Piştî rizgar kirina herêma Şehbayê ji aliyê hêzên YPG û YPJ ê ve jiyanek bi rengekî nû hat afirandin. Bi taybet piştî avakirina saziyên Rêveberiya Xweser ji komîn, meclîs, komîte rengê demokrasiyê bi awayekî nû hat belav kirin û me pê re jiyan kir. Bê guman bi avakirina komîteyên çand û hunerê re. Heyacanek derkete holê ku ew şanda ku veşartî dihat jiyan kirin êdî bikeve piratîkê û ji bo civakê bê pêşkêş kirin. Bê guman mûzîk, sitran û govendên girêdayî çanda resen yê herêmê hene. Lê belê nedihatin bikaranîn. Li ser vî esasî bi avakirina sîstema Netewa Demokratîk di herêmê de bi rastî me karî ew çanda bav û kalan a ku hatibû tepisandin ji nû ve zindî bikin û pêşkêşî civakê bikin”.
“Ji 2017 an heyanî 2023 an de çalakiyên taybet yên hunerî girêdayî herêma Şehbayê hatin Orgenîze kirin, yek ji wan Mîhrîcana Mîtan a yekem, duyem û sêyem bû. Ev mîhrîcan dengvedaneke mezin li ser asta herêmê daye çêkirin û her sal bi fikirên afrînertir tê pêşxistin. Li kêlek wê komîteyên hunerî bi taybet jî ên girêdayî gelê Şehbayê hene û ciwanên herêmê xwe tê de birêxistin kirine”.

**“Jinên Şehbayê sînorên sedsalî şikandin”**

Mihemed diyar kir ku jinên Şehbayê yekemîn car derdikevin û cihê xwe di nava komên çandî de digirin û wiha got:”Jinên Şehbayê yên ku di bin navên olî û kevneşopiya civakê de nedibûn derkevin derve û bi hebûna xwe cihê xwe di nava sazî û xebatan de bigirin. Piştî 2017 an jinên Şehbayê yekemîn car derdikevin û di qadên siyasî, civakî, hunerî, dîplomasî û leşkerî de cih digirin, ev yek weke Şikandina tavahî sînorên civakî yên bi sed salan hatiye pênasekirin e. Jinên Şehbayê niha cihê xwe di komên çandî yên weke Govend, Stran û şanoyan de digirin. Ev gavên pîroz weke gavên dîrokî tên dîtin”.

# Bi deng û hunera xwe reng didin taxa xwe

**Zarokên Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî ya Mexmûrê bi hunera xwe ya ku bi xwe perwerde kirine, reng didin taxa xwe. Çanda xwe bi pêş dixin û ji bo derdora xwe dibin çavkaniya coş û kêfxweşiyê.**

Weke hemû zarokan, zarokên wargeha penaberan a Şehîd Rustem Cûdî ya Mexmûrê jî dixwazin jiyana azad û bi lîstikan bijîn. Her çiqas di nava penaberiyê de mezin bûne jî bi qasî derfetên di destê xwe de, ji xwe re kêfxweşiya jiyanê ava dikin. Bi meraq û kêfxweşiyê teşe didin jiyana xwe û derdora xwe bi bandor dikin. Di hemû aliyên jiyanê de xwe perwerde dikin, li dibistanê, li mal, tax û kolanên xwe. Xwe bi pêş dixin, ji jiyanê hez dikin û ji bo jiyana xwe rengîn bikin û bi kêfxweşî bijîn her dem di nava lêgerînan de ne. Komek ji zarokên wargeha Mexmûrê li taxa xwe, di aliyê hunerî de xwe bi pêş dixin. Taxa xwe ji xwe re kirine cihê perwerdeyê û xwe bi xwe perwerde dikin. Bi hunera xwe ya govend, stran û xêzkirina wêneyan reng didin taxa xwe, çanda xwe bi pêş dixin û ji bo derdora xwe dibin çavkaniya coş û kêfxweşiyê.

**‘Gelek kêfa min ji govendê re tê’**

Jiyan Unver a ku li taxa xwe hunerê fêrî zarokan dike wiha qala destpêkirina xwe ya avakirina koma xwe kir û got: “Min rojek ji hevalên xwe re got ku ez dixwazim komek ava bikim û hûn jî di nav de cihê xwe bigrin û wan jî got em dixwazin di nav de cih bigrin. Me xwe ji roja 15’ê Tebaxê re amede kir, em çûn gel Stêra Zêrîn lê komên wan zêde bûn ji bo wê me koma xwe ava kir. Lê pişte re em hatin gel hev û me careke din koma xwe ava kir û got bila komeke me hebe em ê her roj biçin ser dikê. Gelek kêfa min ji dîlanê re tê, ez ji wan re dibêjim wêneyan çêbikin û ew jî guhdariya min dikin. Di nav koma me de cîranên me, zarokên ji taxa me û du xwişkên min hene. Em rojekê wêne çêdikin, rojek dilîzin, ji xwe re govendê digrin û em dibêjin em ê her tiştî bikin ji bo ku em fêr bibin. Em muzîkên ji bo govendê ji xwe re vedikin, em stranên hunermendên wek Xecê Herdem, Mem Ararat û hunermendên din ji xwe re fêr dibin û dibêjin. Zarokên din jî dikarin ji xwe re pirtûkan bînin û bixwînin, ji xwe re komên govendê amade bikin û pirtûkên dibistanê bixwînin, ji bo ku demên wan vala derbas nebin.”



**‘Em ji xwe re wêneyan çêdikin û govendê digrin’**

Yaren Gungen jî diyar kir ku dema ew bi hevalên xwe re dilîze pir kêfxweş dibe û wiha got: “Ez danê sibehê ji xew radibim, diçim gel hevalên xwe wêneyan çêdikin, em ji xwe re dilîzin û govendê digrin. Bi hevalên xwe re lîstik xweş e, dema ez bi hevalên xwe re dilîzim sebra min tê, lê ji ber ku ez li malê tenê me sebra min nayê.”

**‘Em govendên herêma Botanê digrin’**

Afrîn Sezek kêfxweşiya xwe ya ji bo lîstika bi hevalên xwe re wiha anî ziman: “Dema mirov diçe gel hevalên xwe sebra mirov tê û li gel hevalên xwe lîstik û çêkirina wêne pir xweş e. Ez pitûkên dibistanê dixwînim û xwe fêrî mamikan dikim. Em govendên herêma Botanê digrin, bila zarokên din jî li ser telefonê nelîzin ji ber ku ji çav re nebaş e. Bila waneyên xwe bixebitin, wêneyan çêbikin û li gel hevalên xwe bilîzin.”

**‘Bi muzîkê re hest dibin yek’**

Gulê Keklîk destnîşan kir ku ew li şûna li telefonê mêze bikin ji xwe re pirtûkan dixwînin û got: “Em ji xwe re dilîzin, pirtûkan dixwînin û wêneyan çêdikin. Dayik û bavê me zêde destûr nadin em bi telefonê re mijûl bibin. Em bi xwe jî naxwazin li şûna wê em diçin wêneyan çêdikin û pirtûkan dixwînin. Em wêneyan li ser Rêber Apo, 15’ê Tebaxê û 4’ê Nîsanê çêdikin. Ez di sergovendê de cih digrim, em bi muzîkê re xwe dikin yek û li gorî wê diçin.”

**‘Ez dixwazim bibim bijîjk’**

Adar Keklîk da diyarkirin ku ew her dem dixwaze li gel hevalên xwe bilîze û wiha domand: “Ger em ji xwe re bilîzin divê em hemû bi hev re bin. Ji ber ku em bi hev re kêfxweş dibin û gelek xweş e. Ez dixwazim bibim bijîjk.”

**‘Me îsal li ser 15’ê Tebaxê wêne çêkiribû’**

Dîmen Unver jî diyar kir ew her sal li ser tişteke cuda wêneyan çêdikin û got: “Me li ser 15’ê Tebaxê wêne çêkir, ji ber ku her sal em li ser tiştekî wêne çêdikin ji bo wê me îsal got bila li ser 15’ê Tebaxê be. Em ji xwe re govendê digrin, hinek caran stranan dibêjin.” **NÛ JINHA**

# Dara Jiyanê

Peykersaz û serokê Komeleya Art'Situ "Pascal Bejeannin" ku ji Fransayê berê xwe da Rojavayê Kurdistanê ji bo pêkanîna projeya "Dara Jiyanê" ku dixwaze bi riya vê yekê bal bikşîne ser fedakarî û lehengiya keç û xortên Rojava yên ku li hemberî dagirkeriyê her tim di nava berxwedanê de ne û ji bona azadiyê cane xwe feda dikin.

**Elî Roj**

Dara Jiyanê projeyeke hunerî ye bi hevkariya Komeleya Art'Situ ya Fransî, Desteya Şaredariyan a Herêma Cizîrê û Komeleya Keziyên Kesk a Jîngehî du sal berê amadekarî jê re dihat kirin. Ji beriya du heftiyan bi hatina şandeya Fransî ya ku ji sê kesan ji komeleya Art'Situ pêk tê, ev proje hat pêkanîn. Dara Jiyanê dareke ku ji bermahiyên şer hatiye çêkirin e, bi taybetî şerê li hemberî dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên DAIŞ'ê li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê. Her çekek û bermahiyek ku di vê darê de bi cih bû ya şehîd an jî gaziyekî/e şer e. Ev proje wekî bîrdarî ji bo fedakariyên şervanên şoreşa Rojavayê Kurdistanê ye. Di heman wextê de semboleke dostaniya navbera herdû gelan nîşan dide. Peykersaz Pascal Bejeannin ê ku vê darê çêdike, dixwaze piştgiriya Şoreşa Rojavayê Kurdistanê bike û di heman demê de nerazîbûna xwe li hemberî qirkirina darên zeytûnan li Efrînê nîşan bide.

Girêdayî vê yekê Peykersaz û serokê Komeleya Art'Situ "Pascal Bejeannin" bi hevpeyvînekî ji rojnameya me re axivî.

Naveroka hevpeyvînê weha ye:

**1-Tu dikarî bi kurtî xwe bidî nasîn? Mijara projeya dara jiyanê kengê dest pê kiri û navê "Dara Jiyanê" ji ku hat û çima navê dara jiyanê ye? Sembolîzma wê çi ye?**

Navê min Pascal Bejeannin im, peykersaz û perwerdekarê ciwanan li Fransayê. Di heman demê de ez serokê damezrîner ê komeleya Art'Situ me, komeleyek çandî ye ku armanca wê ew e ku bi mirovên ji çar aliyên cîhanê re bi riya peykerek ji polat ku girêdayî bi pirsgirêkên wan welatan re bicive. Fikir bi awayekî xwezayî hat; zimanê min huner e û min xwest behsa Rojava û têkoşîna şoreşgerî ya gelê Kurd bikim.

Ji bo navê Dara Jiyanê: hemû peykerên Art'Situ navê projeyê li ser zimanê welatê pêwendîdar hatiye wergerandin (li vir proje "Dara jiyanê" ye), ji ber vê yekê Gulistan Sîdo (hevserokatiya komeleya Les Tresses vertes û yekem kesê ku beşdarî projeyê bi Patrice Franceschi re bû) ku ew da me. Ji bo temsîlkirina dara zeytûnê jî, ji ber ku ev dar sembola azadiyê ye û ji aliyê aborî û ekolojîkî ve li Kurdistanê (bi taybetî li herêma Efrînê ya ku niha hatiye dagirkirin) girîng e.

Ji ber vê yekê sembol di nihêrîna pêşîn a peykerê de hêsan e û bi hêsanî tê xwendin û tê fêm kirin.




Bingeha darê bi çekên şer ên ku ji bo şerê li dijî DAIŞ'ê hatine bikaranîn hatiye çêkirin. Çiqas dar bilind dibe û mezin dibe, çek kêm dibin. Peyam careke din hêsan e, "jiyan li beramber kujeran bi ser dikeve. Çek hene ji ber ku mixabin beşek ji dîroka Kurdistanê ne û girîng e em wan bi bîr bînin da ku careke din nekarin wan çekan bikar bînin. Ji bîrkirina rabirdûya xwe, mehkûmî ji nû ve zindîkirina wê ye. Lê belê, divê jiyan were qezenc kirin.

**2-Kes, kesayet û saziyên ku ji destpêkê û heta sazkirinê cihê xwe di vê projeyê de girtine kî ne? Herweha kesên ku alîkariya we kirine û di dema amadekirina projeyê de çi zehmetî hatin dîtin?**

Kesên ku di projeyê de alîkarî kirin Patrice Franceschi ye. Wî me bi Gulîstan Sîdo da nas kirin, piştre me hevdîtin bi endamên komeleya Keziyên Kesk û hunermendan re çêkir. Endamên wê bi hevkariya şaredariyê û Navenda Çandê ya Mihemed Şeko li Qamişloyê ev proje bi rê ve birin.

Zehmetî bi taybetî ji bo derbasbûna dergehê sînorî di navbera başurê Kurdistan û Rojava de bû. Wekî din, tenê pirsgirêkên piçûk ên klasîk, îdarî û pragmatîk hebûn.

**3- Ji bo Fransiyan danîna dara jiyanê ya sembolîk li Rojava tê çi wateyê û çima we Rojava hilbijart da ku vê darê li wir deynin?**

Kurdistan û Fransa ji Peymana Lozanê ya sala 1923'an û vir ve xwedî dîrokeke hevpar in, ku di van demên dawî de bi şerê li dijî DAIŞ'ê berdewam kir. Têkoşîna hevpar a hemû gelên azadîxwaz e, ku dixwazin ji bo xwe bifikirin û bijîn e. Têkoşîna hemû jinên ku koletiyê naperjrînin.

Di medyayê de kêm an jî bi xirabî behsa wê tê kirin û me xwest bi rêya hunerî û belgefîlmekê dengê xwe bidin aktorên vê jiyana Rojava.

**4-Gelek dibêjin divê dara jiyanê kesk be û ne hesin be û gelek dibêjin çima ew dar bi çek û alavên leşkerî hatiye çêkirin û gelek pirsên din têne kirin. Hûn vê yekê çawe şîrove dikin?**

Dar ji hesin hatiye çêkirin ji ber ku çek ji hesin in. Ger kesek bi tivingê êrişê azadiya min bike, ez ê kulîlkan neavêjim ser wan, lê ez ê li dijî wan şer bikim; Ez ê heman rêbazê wekî wî bikar bînim. Wisa ye!! Roja ku şer bi daran bê kirin ez ê peykerekî ji dar çêbikim. Peykerê Dara Jiyanê rastiyê nîşan dide. Şax û pelên hesinî nîşan didin ku jiyan bi ser dikeve û wê bidome, wê li dijî êrîşan li ber xwe bide. Ji ber ku ew bi hêztir e, ji ber ku bi berdêla gelek jiyanan hatiye bidestxistin.


**5-We Rojava, gel û rêveberiya wê çawa dît? Dema ku we xebata xwe bi serkeftî bi dawî kir û li Rojava dara jiyanê bi şahî û coşeke mezin hate danî, wê pêşwaziya gel ji we û karê we re, çawa dît û hîs kir?**

Gelê Kurd gelekî bi heybet e, wêrek e, xwedî vîneke bêhempa ye, ew dixwaze azad bijî, bi çanda xwe û di nava demokrasiyê de. Demokrasiya ku ji bo hemû demokrasiya cîhanê mînak e. Ez vê yekê ji bo dilxweşiya hin kesan nabêjim, ne şêwazê min e. Ez vê yekê dibêjim ji ber ku ez jê bawer dikim. Ez li gorî ezmûna xwe û gerûgeştên min yên di nav gelên cihêreng yên li welatên din ên di nav şer de nêrîna xwe pişt rasdikim.

Li Fransayê me serdema Ronahiyê jiyan kir û şoreşa me gelek şoreşên cîhanê av dan. Niha, ev çend nifş in, em li hemberî pirsgirêkan bê berpirsyarî nêz dibin, her tiştê me heye bêyî ku em heq bikin an ji bo wê şer bikin. Li hemberî pirsgirêkeke herî biçûk em çareseriyê ji dewleta refahê hêvî dikin, me pir ji dev xwe berdaye û em bê xem bûne.

Gelê Kurd ji bo xwedî li xwe derkeve û xwe ji rewşên zehmet rizgar bike, xwe dispêre vîna xwe. Ez wisa dihizirim ku divê êdî şoreşa Kurd rola pêşengtiyê ji dêvla şoreşa Fransayê werbigre û bibe mînaka vîna jiyana azad. Lê hişyar bimînin, Fransa tenê di xew de ye, ew dikare careke din ji xew şiyar bibe.

**6- Berê we li çend welatan peyker an sembol/ peykersaz danîne û hûn çawa pêşwazîkirina vê li Rojava dibînin? Hûn dikarin vegerin kurteçîroka xebatên xwe yên berê.**



Min peyker li gelek welatên ku ez tê re derbasbûme saz kirin, mînakî hirçê cemsar li Gronlandê, gorîllayek li Afrîkayê an kelekek çerm li golê li Fransa (li benda cîhek din). Li bajarê min ê Fransa li ser bîrdariya şer a ji bo Fransa (di şer de) dîkê min ê polat jî heye. Ya ku herî zêde nêzî dara Qamişlo dibe ew e. Li welatekî ku di nav şerê çekdarî de ye, bandor ji hêla hestyarî ve pir mezintir e. Lê rewş çi dibe bila bibe, huner heye ku hest û ramanan derxe, aliyên negatîf jî hebin, ew rê li ber gengeşe û pêşveçûnan vedike.

**7. Li Fransayê, peykerên weha hene ku li meydanên giştî hatine danîn, ku şerên berê tîne bîra nifşên nû. Tu dikarî çend navan bidî? Çi sembolîze dike?**

Li Fransayê li her bajarekî bîranînên şer ku bi navê kesên ku di şer de jiyana xwe ji dest dane hene. Ew peyker çîroka tekoşerên ku li dijî kesên ku dixwestin awayê jiyan û ramana xwe li ser me ferz nîşan didin. Têkiliya hevpar a herî mezin a di navbera herdû gelên me de ev e.

**8- Piştî danîna dara jiyanê li Rojava, hûnê çi bikin û ji bo paşerojê çi planên we hene, da ku şoreşa Rojava di nav civaka Fransî de baştir were naskirin û xuya kirin û di qada navneteweyî de piştgirî werbigire. Di navbera gelan û civakan de projeyên çandî û hunerî dikarin çi rolê bilîzin?**

Projeya me we Art'Situ û derhênerê me Cédric Bejeannin ku em li ser gera xwe ya Rojava û çêkirina peykerê bi serpêhatiyên hemû şahidên li Rojava yên me berhev kirine belgefîlmekê çêbikin. Em dixwazin ev belgefîlm ji hêla gelek kesan ve li Fransa û heke gengaz be li gelek welatan jî were dîtin. Em dixwazin temaşevanên ciwan ên Fransî zanibin ku ciwanên di temenê wan de çawa li Rojava bi serbilindî jiyanê berdewam dikin, û li dijî hemû desthilatdarên vê herêmê yên dixwazin îrada wan bişkînin li berxwe didin.

Em jî dixwazin ger derfetên me yên aborî û îdarî hebin, vegerin û li bajarê Qamişlo vî fîlmî nîşan bidin û li gel hemû kesên ku di encamdana vê projeyê de beşdar bûne temaşe bikin.

**9. Peyama we ya dawî ji bo ciwanên Kurd û Fransî çi ye?**

Peyamek ji bo ciwanên Kurd: Serbilind bijîn, tiştekî girîngtir nîne. Ji bo ciwanên Fransî: Dest ji gazinan berdin, çoka ku li erdê ye rakin. Paşeroj dê dijwar be, em ê ji bo azadiya xwe têbikoşin. Jiyaneke bi serfirazî çêtir e.



# QSD: Şerê me li hmberî çeteyan e

Fermandariya QSD'ê diyar kir ku tu nakokiya wan bi gelê Dêrazorê re tune ye, lê şerê niha li herêmê rû dide bi çeteyên dewleta Tirk a dagirker û endamên girêdayî hikumeta Şamê re ye. QSD'ê bang li şêniyan kir ku neyên lîstokên hêzên dijber.

**Navenda nûçeyan**

Fermandariya Giştî ya Hêzên Sûriya Demokratîk têkildarî pêşketinên Operasyona "Xurtkirina Ewlehiyê" li ser malpera xwe ya fermî daxuyaniyeke nivîskî weşand.

**Daxuyanî bi vî rengî ye:**

``Hêzên me operasyona `Xurtkirina Ewlehiyê` li dijî şaneyên DAIŞ`ê û kesên sûcdar da destpêkirin. Piştre hêzên cuda yên derve destwerdan kir û xwestin vê operasyonê wekî fersendekê ji bo pêkanîna planên xwe bi kar bînin. Bi taybetî di 3 rojên dawîn de navbera Hêzên Sûriya Demokratîk û Meclisa Leşkerî ya Dêrazorê li aliyekî û çeteyên çekdar ên girêdayî hin saziyên ewlehiyê yên hikumeta Şamê yên ku derbasî aliyê rojavayê çemê Firatê bûn ji aliyekî din ve, şer qewimî. Çeteyên ku di çemê Firatê û xeta Salihiyê re derbasî herêmê bibûn, hewl dan fitneyê û şer navbera gelên herêmê derbixin. Her wiha di aliyê propogandayê de jî hewl didin wêneyekê bidin nîşandan ku ev şerê navbera Hêzên Sûriya Demokratîk û gelê Dêrazorê ye. Ev îdia derew e û ne rast e, nemaze ku operasyona `Xurtkirina Ewlehiyê` li ser daxwaza gelê Dêrazorê û şêx û eşîran pêk hat. Tu nakokî an pirsgirêk di navbera gelê Dêrazorê û hêzên me Hêzên Sûriya Demokratîk de tune ye, berevajî vê yekê her kes dizane ku QSD`ê gelê herêm ji zulma DAIŞ`ê rizgar kir û niha gelên herêmê diparêze û heta niha ewlehî û îstiqrarê pêk tîne.

Armanca ji propogandaya hewl dide rewşa li ser erdê wekî şerekî di navbera hêzên me û eşîrên Ereb de bidin nîşandin, ji bilî derxistina fitneyê û şikandina yekîtiya QSD`ê û gelên herêmê ne tiştekî din e. Herwiha hinek aliyên dijber hewl didin vê rewşê wekî nakokiyeke Kurd û Ereban bidin nîşandan. Ev lîstok ji destpêka aloziya Sûriyeyê ve berdewam e, her tim hewl dan xeta şoreşê biguherînin û wekî şerekî navbera ol, mezheb û neteweyan bidin xuyakirin.

Ji sala 2013`an ve gelek aliyan hewl dan şerê Hêzên Sûriya Demokratîk yê li dijî DAIŞ`ê wekî şerê di navbera Kurd û Ereban bidin xuyakirin û ev polîtîkayên wan heta roja me ya îro dewam dike. Lê ya rast tu nakokiyên gelê Ereb bi gelê Kurd re tune ye û tu nakokiyê gelê Kurd bi gelê Ereb re tune ye. Her du gel bi salên dirêj bi hev re di nava aramî û îstiqrarê de dijîn, her wiha tevahî saziyên Rêveberiya Xweser û Hêzên Sûriya Demokratîk ku 8 sal di ser damezirandina wan re derbas bûne, bi keç û xortên wê yên Ereb, Kurd, Suryan û Ermen mil bi mil şer dikin û xwîna wan a pak li ser vê xakê herikî ta herêmên me ji destê çeteyan rizgar kirin. Di esas de QSD`ê nîşaneya herî bihêz e ku yekitiya tevahî gelên herêmê, bi taybetî yekitiya gelên Ereb û Kurd îsbat dike. Lewra bi van îdiayên xirab hewl didin bi hestên gelên herêmê bilîzin û wan li hemberî hev bin sorkirin. Em di wê baweriyê de ne ku gelê me haj ji van lîstokan heye, helwesta QSD`ê ya li hemberî van lîstokan jî parastina herêmê bi tevahî pêkhateyên wê ye, ev yek jî bersiva herî xurt a li dijî tevahî fitne û lîstokan e.

Di heman demê de dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê hewl didin vê rewşê wekî fersendekî bi kar bînin û li ser vê yekê ji 5 aliyan ve êrişî eniyên parastinê yên Meclisa Leşker ya Minbicê kir. Lê şervanên Meclisa Leşkerî ya Minbicê bi lehengî şer kirin, tevahî êriş têk birin û koma çete ya ku xwe gihand nuqteya meclisê kontrol kir, gund paqij kir û zirarên mezin gihand çeteyên dewleta Tirk a dagirker. Ev bersiva herî mezin a QSD`ê ye li hember her kesê hewl dide gelê herêmê û ewlehiya wê şantaj bike.

Li ser vê yekê, di serî gelê me yê Dêrazorê em bang li tevahî gelên herêmê dikin ku neyên mîna van lîstok û fitneyan. Hêzên Sûriya Demokratîk hêza parastina tevahî gelên herêmê ye. Şerê niha di navbera Hêzên Sûriya Demokratîk û çeteyên dewleta Tirk a dagirekr- endamên girêdayî ewlehiya rejîmê de ye. Tu nakokî di navbera QSD û eşîrên herêmê de tune ye, em her timî bi eşîran re di nava têkiliyan de ne. Fedakariyên ku em didin ji bo xurtkirina ewlehî, îstiqrar û aştiya gelên herêmê ye. QSD`ê dê ji pêkanîna mîsoyona xwe ya parastina herêmê ji tevahî êrişên dijber ên li dijî yekitiya gelên herêmê û îstiqrara wê dudilî nabe."

# 'Rûspiyên eşîra Şemer û Begara piştgirî dane QSD'ê

**Rûspiyê eşîra Şemer Etiye El Amûdî El Şemerî û eşîrên Bagara diyar kirin ku ew piştgiriyê didin QSD`ê û gotin: "Em ji bo têkbirina hemû hewldanên xirakirina ewlehiya herêmê amade ne."**

Rûspiyê eşîra Şemer Etiye El Amûdî El Şemerî têkildarî hewldanên derxistina fitneyê li Dêrazorê ji ajansa me re axivî. El Şemerî got:"Em destekê didin Operasyona `Xurtkirina Ewlehiyê` ku QSD`ê 27`ê Tebaxê dijî şaneyên DAIŞ`ê, kesên destên xwe di sûcên li herêmê de hene, bazirganên hişbirê û xirabkaran daye destpêkirin."

El Şemerî wiha domand: "Destên derve hewl didin fitneyê di nava êl, eşîr û QSD`ê de li Dêrazorê derxin, da ku tirs û xofê di nava welatiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de belav bikin. Lê ev hevgirtina nîştimanî ku di bin sîwana projeya neteweya demokratîk de pêk hatiye, têk naçe."

El Şemerî anî ziman ku tevahî pêkhateyên eşîra Şemer li dijî planên têkbirina ewlehî û îstîqrara herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê,



li kêleka QSD`ê ne.

El Şemerî bang li tevahî eşîrên Ereban kir ku hişyar bin û nekevin xekfa propagandaya dewleta Tirk a dagirker, çeteyên wê û ya rejîma Baasê ku hewl didin ewlehiyê têk bibin.

**Qebîleya Begara jî ji QSD`ê xwest ku gundên wan rizgar bikin**

Qebîleya Begera û xekê bajarê Dêrazorê bang li QSD û Koalîsyona Navneteweyî kirin ku gundên wan ji milîsên Îran û hikumeta Şamê rizgar bikin.

Qebîleya Begera û xelkê bajarê Dêrazorê bi daxuyaniyekê ragihandin ku ew aliyên derve yên hewl didin herêmê ber bi fitneyekê ve bikişînin red dikin.

Di daxuyaniya hatî xwendin de hate gotin: "Em zarokên qebîleya Begera û xelkê Dêrazorê bi daxwazên aştiyane yên şêniyên me re ne ku dikevin xizmetî ewlehî û istiqrara herêmê. Em ê nehêlin milîsên Îranê û rejîma sûcdar derbasî herêmên me bibin. Em amade ne li hemberî çi kesên ku ji destpêka şoreşê ve xwîna gelê me yê Sûriyeyê rijandin, şer bikin. Niha jî hewl didin herêmê ber bi şerkî vekirî ve bikişînin û istiqrara herêmên me xirab bikin."

Di dawiya daxuyaniyê de bang li



Koalîsyona Navneteweyî û QSD`ê hat kirin ``Berpirsyarên xwe yên parastina herêmê ji destwerdana Îran û rejîma Şamê pêk bînin û her heft gundên wan ji milîsên Îran û rejîma Şamê rizgar bikin da ku şênî vegerin gundên xwe.``

# Dagirkeriya tirk di mehekê de 51 caran êrişî Efrîn û Şehbayê kir

**Navenda Ragihandinê ya Hêzên Leşkerî yên Efrîn û Şehbayê ragihand ku dewleta Tirk a dagirker, di Tebaxê de, herî kêm 51 caran êrişî her du herêman kiriye.**

Li gorî bîlançoya meha Tebaxê ku ji aliyê Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya Hêzên Leşkerî yên Efrîn û Şehbayê ve hatiye parvekirin, artêşa Tirk di navbera 3-31'ê Tebaxa 2023'an de 33 gund, bajarok, navçe û bi sedan qadên Efrîn û Şehbayê bombebaran kir. Li gorî daxuyaniyê, di 51 êrişên bi hawan, drone û obusan de 256 topên hawanê, 164 obus, 6 roket, 6 caran drone û Sîha hatin bikaranîn. Di êrişan de zirera madî rû da.

Dewleta Tirk a dagirker heman mehê, 4 caran bombe li baregehên leşkerî yên hikumeta Şamê barand. Di êrişan de 10 leşkerên hikumeta Şamê birîndar bûn.

Hêjayî bîrxistinê ye ku rojane deverên şehba, Efrîn û heremên bakurd û rojhilatê Sûriyê têne bombebaran kirin û rojane welatî têne hedefgirtin û kiryarên dagirkeriya tirk li pêş çavê cîhanê tev têne meşandin û kes dengê xwe jêre nake.



# PDK`ê çavkaniya xiyanetê ye

Ev 27 sal di ser xiyaneta Partiya Demokrata Kurdistanê re derbas bû, ku PDK`ê bi hevkariya artêşa rejîma Baas a Iraqê bi tangan êrişî Parlamentoya Herêma Kurdistanê kirin.

**Deriya Çiya/Qamişlo**

Di dîroka siyasî ya Kurdan de gelek xiyanetên mezin hatine kirin, lê xiyaneta 31'ê Tebaxa 1996'an a Barzaniyan yek ji wan xiyanetên herî mezin bû. 31'ê Tebaxê yek ji mezintirîn qonaxên gurkirina şerê navxweyî ye ku heta îro di bîra mirovan de maye. Ev xiyanet bûye wek modêleke ku xiyanetên berê û niha yên Başurê Kurdistanê nîşan dide û her carê xwe bi awayekî din dubare dike. Di dîroka têkoşîna Başûrê Kurdistanê de, gelek bûyerên ku rûpelên reş ên dîrokê tijî kirine hene. Roja 31'ê Tebaxê jî yek ji wan rojan bû.



### Xiyaneta 31`ê Tebaxê

Gelê Kurd li Başurê Kurdistanê di sala 1991'an de li dijî rejîma Baas xwepêşandanek hate lidarxistin û beşeke mezin ji axa Başurê Kurdistanê ji destê rejîma Baas derxistin û bû yekem car ku deriyê azadiyê ji wan re vebû.

Lê ev dilşadiya gelê Başur zêde dom nekir. Şoreşgerên kurd û desthilatdarên wan li ser destkeftên şoreşê zengilên şerê navxweyî lêda û careke din bû sedem ku gelê Kurd bikeve nava tengasî û aloziyan de.

Piştî serhildanê, nakokiyên di navbera Partiya Demokrata Kurdistanê PDK`ê û Yekîtiya Niştimaniya Kurdistanê YNK`ê de ku berê hebûn, Zêdetir bûn û di destpêka Gulana 1994`an de li navçeya Raniye yekem pevçûn di navbera Yekîtiya Niştimaniya Kurdistanê de derket û ev şer li Başurê Kurdistanê belav bû, baregehên YNK'ê yên li Dihokê û baregehên PDK'ê yên li Silêmaniyê hatin girtin.

Di 4'ê Gulana 1994`ê de serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê Mesûd Barzanî daxwaza rawestandina şer û civînê kir, lê ev daxwaz encam negirt û di 15'ê Gulanê de şerê navxweyî di navbera Yekîtiya Niştimaniya Kurdistanê û Partiya Demokrata Kurdistanê gihîştin bajarê Hewlêrê.

Di 19'ê Gulana 1994an de, Odeya Operasyonên Aştiyê li Havîn Hawarê a Hewlerê hat avakirin, û piştî civîna Mesûd Barzanî û Kosret Resûl, biryara agirbestê hat dayîn, lê ev jî encam negirt û şer berdewam kir.

Di 3ê Hezîrana 1994`an de Sekreterê Giştî yê YNK`ê Celal Talebanî agirbesteke yekalî ragihand. Ev biryar hevdem bû li gel serweriya Hizba Demokrat a Kurdistanê û Tevgera Îslamî li ser deverên Qeladze û Pêncwîn.

Di 31`ê Hezîrana heman salê de Parlamentoya Herêma Kurdistanê bi amadebûna Celal Talebanî û Mesûd Barzanî civiya. Ev civîn bi ser ket ku şer û alozî heta radeyekê kêm bike, lê heta dawiya sala 1994'an li hinek cihan pevçûn berdewam kirin.

Di destpêka sala 1995'an de careke din şer di navbera Yekîtiya Niştimaniya Kurdistanê û Partiya Demokrat a Kurdistanê de dest pê kir. Di 15'ê Çile de hêzên Yekîtiya Niştimaniya Kurdistanê bajarê Hewlêrê desteser kir. Şer heta 9'ê Tebaxa 1995'an berdewam kir. Herdu polîtburoyên YNK û PDK'ê li paytexta Îrlanda Dublin bi navbeynkariya Amerîkayê civiyan, lê ev civîn bi ser neket û nekarîn rewşê kontrol bikin.

Di 28'ê Tîrmeha 1996'an de hêzeke pasdarên Îranê bi hevkariya



Yekîtiya Niştimaniya Kurdistanê sînorên Başurê Kurdistanê derbas kirin û êrîşî baregeha Partiya Demokrat a Kurdistanê ya Îranê li Cebel Heybet Sultan kirin.

Şeva 17-18'ê Tebaxa 1996`ê li Riwanduzê cara sêyemîn di navbera YNK û PDK'ê de şerê navxweyî derket. YNK'ê Safîn û Şeqlawa girtin û xwe nêzî Bayramê kirin. Wê demê piraniya wê herêmê di destê PDK'ê de mabû.

Di 22`ê Hezîrana heman salê de serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê Mesûd Barzanî nameyek ji serokê rejîma Baas Sedam Husên re şand û daxwaza hevdîtinê kir. Name bi van gotinan dest pê kir: "Birêz Serok, ji bo destwerdana Îranê di karûbarên Iraqê de vê hişyariyê di ber çavan re derbas bikin."

Çend roj piştî şandina vê nameyê, Mesûd Barzanî çû Bexdayê û bi Sedam Husên re hevdîtin pêkanî û li hev kirin. Li gorî vê peymanê, artêşa Baasê alîkariya PDK'ê kir ku Hewlerê desteser bike. Ji aliyê din ve jî PDK`ê rê da Artêşa Baas ku alîgirên opozîsyona Iraqê li Hewler û Bîrmamê bigire û dest bi êrişa ser baregehên wan bike.

Vê peymanê hişt ku Mesûd Barzanî bi cîbicîkirina şertên vê peymanê yên bi Seddam Husên re leztir bike. Ji aliyê din ve jî, di 21'ê Tebaxê de, rojek beriya ku Mesûd Barzanî peyamekê ji Sedam Husên re bişîne, Celal Talebanî ji Fermandarê Giştî yê Pasdarên Îranê Mihemed Caferî re peyamek şandibû û daxwaz kiribû ku bilez hêz bên şandin.

Sibeha 31'ê Tebaxê hêzên Artêşa Baas ji Kerkûk û Mûsilê ber bi Hewlêrê ve çûn û hejmara artêşa Iraqê gihişt 30 hezar leşker û 150 tankan. Yekemîn destkefta hêzên Yekîtiya Niştimaniya Kurdistanê li ser rêya Xor-Hawlêr bû. Yekîtiya Niştîmaniyan Hewlêr bê parastin hişt û Partiya Baas bajarê Hewlêrê dagir kir û tankên Baas gihiştin ber avahiya Parlamentoya Herêma Kurdistanê.

Piştî mehekê ji bûyera 31'ê Tebaxê, hêzên Yekîtiya Niştîmanî bi alîkariya pasdarên Îranê careke din êrîş kirin, Silêmaniyê girtin û xwe nêzîkî Hewlêrê kirin, lê rejîma Baas a Îraqê gef ji YNK`ê xwar û got; Heger zêdetir pêş bikevin, dê alîkariya PDK'ê bikin û dîsa êrîş bikin.

Piştî gefên rejîma Baas, balafirên şer ên dewleta Tirk ji bo ku rê li pêşiya pêşketinên hêzên Yekîtiya Niştîmanî bigirin, li Koyî, Şeqlawa û Raniyeyê êrişî hêzên Yekîtiya Niştimaniya Kurdistanê kirin. Balafirên dewleta Tirk nehiştin YNK`ê di nav sînorên xwe yên berê de bi cih bibe.

Vê yekê jî rê li ber parçebûna Başûrê Kurdistanê vekir ku di bin serweriya du partiyan de be. Piştî vê demê li herêmê du rêveberî hatin avakirin. Navendên Hewlêr û Dihok ku di bin serweriya Partiya Demokrata Kurdistanê de ne û navendên Silêmaniyê û Germiyanê yên girêdayî Yekîtiya Niştimaniya Kurdistanê ne. Dikare bê gotin ku rêveberiya du navendan heta îro jî didome.

### Hejmara qurbaniyên 31'ê Tebaxê

Di encama êrîşa 31'ê Tebaxê de 450 kesan jiyana xwe ji dest dan û zêdeyî 200 kes jî birîndar bûn. Zêdeyî 100 kes jî winda bûne. Tê gotin ku di şerê navxweyî de zêdetirî 12 hezar kesan jiyana xwe ji dest dane.

Heya niha li hemberî vê xiyanetê tu helwest nîne. Ji ber ku; Li gorî çavdêran dûbarebûna bûyerên bi vî rengî ne dirêj e. Her dema ku berjewendiyên partiyên desthilatdar dikevin bin metirsiyê, dibe ku hêzên derve bînin ser axa Başûrê Kurdistanê da ku bi rêya xwe bigihin tiştên ku dixwazin.

Ji bilî wê yekê Parlamentoya Herêma Kurdistanê li ser vê xiyanetê helwest nîşan neda û şermezar nekir.

### Xiyaneta 31`ê Tebaxê hîn berdewam e

31'ê Tebaxê ne tenê xiyanet e, di heman demê de ev bûyer di dîroka têkoşîna nû ya Başurê Kurdistanê de bûne mînak. Her dema ku di navbera hêzên Kurdî de nakokî çêdibûn, hewl didan hêzên biyanî bikar bînin da ku bi rêya wan hêzan hêza xwe û hebûna xwe biparêzin.

Xiyanet li Başurê Kurdistanê bûye ji rêzê û xiyaneta herî dawî jî di 3'ê Tebaxa 2014'an de radestkirina Şengalê ji çeteyên DAIŞ'ê re û bûyerên 16'ê Cotmeha 2017'an ku artêşa Iraqê êrîşî Kerkûkê kir û herêmên din desteser kir. Başurê Kurdistanê li derveyî îdareya Herêma Kurdistanê ye û Kurdan ji sedî 51'ê axa xwe ji dest dane.

Ji ber ku ev îxanet nebûye mijara nîqaşa neteweyî, vê yekê hişt ku dewleta Tirk bi piştevaniyê hewl bide %30 ji xaka Başurê Kurdistanê dagir bike.

Piştî wê jî di 9'ê Cotmeha 2020an de di navbera Partiya Demokrata Kurdistanê û Hikûmeta Kazimî de rêkeftina Şengalê hat îmzekirin. Li gorî peymanê, "Hikûmeta Iraqê dê vegere Şengalê û divê Rêveberiya Xweser a Şengalê bê hilweşandin." Herwiha dewleta Tirk bi hevkariya Partiya Demokrata Kurdistanê bi qasî 40 k.m li hin deverên sînorî ketine nava axa Başurê Kurdistanê û dagirkeriya xwe didomînin. Îro jî diyar e ku Partiya Demokrat li Zapê li ber dagirkeriya artêşa Tirk a faşîst rê vedike.

Bûyerên bi vî rengî bi zelalî nîşan didin ku heta niha xiyanet li vî welatî bi dawî nebûye û her carê bi rengekî din derdikeve holê. Xiyanet ketiya kûrahiya siyaseta desthilatdaran de. Ji bo parastina berjewendiyên xwe û lawazkirina hêzên dijber, her kêlî dikarin xiyanetê bikin û dagirkeran bînin herêma Kurdistanê û erdên xwe radestî wan bikin.



# 'Divê Rêxistinên navneteweyî li hemberî tecrîdê bêdeng nemînin'

Dewleta Tirk a fşîst bi ferzkirina Tecrîda girankirî ya ku li ser Rêber Apo tevhiay pîvan û zagonên mafê mirovan bi pê dike. Parêzer Cibraîl Mistefa diyar kir ku li hemberî sûcê tecrîdê, divê rêxistin û saziyên navneteweyî bi erka xwe ya exlaqî rabin û helwsta xwe nîşan bidin.

**Vîndar Roj/ Şehba**

Hêzên desthilatdar û dagirker ji bo berjewendiyên xwe, pirsgirêk û qeyranan di Rojhilata Navîn de derdixin û kurtir dikin. Di sedsala 21'emîn de li hember van diyardeyan hêza çereseriyê bi modêla Netewa Demokratîk ji aliyê Rêber Apo ve hat pêşkêşkirin. Ev fikirê ku hatiye pêşxistin, ji bo berjewendiyên tavahî mirovahî, netew, ol û pêkhateyan hatiye afirandin. Rêber Apo li hemeberî pirsgirêkên cîhanî yên ji aliyê hêzên serwer ve hatine derxistin, herwiha li hemberî pirsgirêkên gelan xwe berpirsyar dît û çareserî ji hermû cîhanê re da xuyakirin. Lewra hemû hêzên navnetewî li hember Rêber Abdullah Ocalan bûn yek û bi Kompiloyeke Navneteweyî xwestin vî fikirî ji holê rakin û di bin destên xwe de têk bibin. Îmralî ne girtîgeheke ji rêzê ye, mirov di aliyê fîzyeolojî û hişmendî de têk dibe. Rêber Apo ev 24 sal in ku di nava lepên dijmin de li ber xwe dide û fikirên hêzên faşîst yên ku dixwastin îdeolojiya Rêbertî ji holê rakin, têk bir. Ji lewra ev bû nêzî 3 salan ku dewleta Tirk a faşîst tecrîdeke girankirî daye ferizkirin û tu agahî ji Rêber Apo nayên girtin.

Têkildarî tecrîda giran ya ku li ser Rêber Apo tê meşandin, endamê Insiyatîfa Parêzerên Sûriyê yên ji bo Parastina Rêber Abdullah Ocalan, Cibrayîl Mistefa ji rojnameya me re axivî.



### 'Li hemberî sîstemên desthilataran, Konfedralîzma Demokratîk'

Cibrayîl anî ziman ku fikrê Rêber Apo ji bo xelasiya mirovahiyê ji qirkirinê ye û wiha got: "Li hemberî siyaseta Modernîteya Kapîtalîst ya ku ji aliyê hêzên desthilatdar yên ku dixwastin cîhanê tavahî bixin bin kontirola xwe de, Rêber Abdullah Ocalan bi fikirê xwe yên ji bo azadiya tavahî mirovahiyê, pirojeya Konfedralîzma Demokratîk da pêşkêş kirin. Ev yek di encama lêgerîn û nîqaşkirina pirsgirêkên gilobal û yên civakê, her wiha li hember modernîteya Kampîtalîzim yê ku hakimiyeta xwe li ser tavahî mirovahiyê kiriye û nirxên civakî di nava xwe de tune kiriye, hat derketin. Bi kurtasî ji bo hişyarkirina civakê li hember siyasetên helandinê ku tên meşandin, di heman demê de xelasiya mirovahiyê ji qirkirinê ye. Her wiha ji bo çareserkirina pirsgirêkên ku di Rojhilata Navîn de tên qewmandin bibe çareserî ye."

### 'Armanc pêkanîna xeyalên dagirkeriyê û qutkirina gel ji Rêber Apo ye'

Cibrayîl bal kişand ser armanca hêzên kompiloger ji tecrîdê û wiha domand: "Rêber Abdullah Ocalan ne girtiyekî ji rêzê ye ku tecrîdeke bi vî rengî re derbas bibe. Rêber Apo temsîla 60 mîlyon Kurd dike û têkoşîna azadiyê dide meşandin. Bi dawîkirina sedsaliya peymana Lozanê dagirkeriya Tirkiyê dixwaze peymana Mîsaqa Milî ya ku naveroka wê dagirkirina Kerkok, Musil û heyanî Helebê bi kurbûna 40 kîlo metir e pêk bîne. Pirojeya Rêber Apo di vê serdemê de li hember vê yekê hatiye sekinandin û pilanên faşîzma Tirkiyê têk diçin. Her wiha ji bo gelê Kurd pilanên qirkirinê yên demdirêj di hişmendiya Tirkiyê de her xwe nûjen dike, bi riya tecrîda ku tê meşandin qirkirina gelê Kurd armanc dikin. Ev nêzî 3 sala ye ku parêzer û malbata Rêber Apo ji bo hevîdtina pê re t tu agahî nayên wergirtin".

Cibrayîl diyar kir ku rêxistina CPT û rêxistina Efûkirina navnetewî eşkere kirin ku di Îmraliyê de binpêkirin tên kirin û demokrasî nîne, lê belê yekîtiya Ewropa tu seknekî cidî li hember Tirkiyê nîşan neda ye û wiha domand: "Ji sala 1999'an ve heyanî niha rêxistina CPT 9 caran derbasî Îmraliyê bûye, herî dawî CPT û rêxistina efûkirina navnetewî her duyan eşkere kirin ku Îmralî Giwantanamoya duyemîn e û binpêkirin tên kirin, li hember van tesbîtan Yekîtiyta Ewropa tu helwestên xwe yên cidî li hember Tirkiyê heyanî niha raber nekiriye. Ji ber hebûna berjewendiyên hevpar di navber faşîzma Tirkiyê û yekîtiye Ewropa de hene yek ji wan jî armanca derbaskirina Tikiyê ji Yekîtiya Ewropa re ye."

### 'Divê rêxistinên navnetewî bi erka xwe rabin'

Endamê Insiyatîfa Parêzerên Sûriyê yên ji bo Parastina Rêber Abdullah Ocalan, Cibrayîl Mistafa da xuyakirin ku di van demên dawiyê de CPT derbasî Tirkiyê bû lê belê derbasî Îmarliyê nebû û wiha axaftina xwe bidawî kir: "Di van demên dawî de hin agahî hatin girtin ku rêxistina navnetewî ya CPT derbasê Tirkiyê bûye, lê belê derbasî Îmraliyê nebûne. Me lêpirsîn kir ku çima derbas nebûne hat eşkere kirin ku gotine "Derbasbûna Îmraliyê ne hewce ye". Hat dîtin ku li hember Rêber Apo tu seknên cidî nînin û dixwazin Rêber Apo weke girtiyekî normal bigirin dest. Li hember vê yekê em banga rêxistinên têkildar yên navneteweyî dikin ku divê li hember Tirkiyê helwestên cidî bên nîşandan û di doza azadiya Rêbere Apo de dest ji berjewendiyên xwe berdin û cidî bin."

# 'Gelên Siwêdayê ji bo parastina rûmetê serî rakirin'

**Hemza Sêvo/Qamişlo**

**Piştî 12 salan ji kirîza Sûriyê, welatiyên parêzgeha Siwêdayê careke din rabûn ser piyan û li dijî hikumeta şamê xwepêşandanên berfireh li dar xistin. Derbarê xwepêşandanan de nûnera Partiya Nûjeniya Demokratîk Heyfa Mehmûd bang li gelên Siwêdayê kir ku nehêlin tu hêzên derve destwerdana xwepêşandanan bike.**

Kirîza Sûriyê 12 sal li pey xwe hiştin. Hikumeta Şamê, Rûsya, Îran, dagirkeriya Tirkî û çeteyên girêdayê wê yên navê oposizyonê li xwe dikin, bi ti awayî nikarîbûn çareseriyeke bingehîn ji vê kirîzê bibînin . Lê berovajî vê yekê xwesteka wan domdariya kirîzê bû. Piştî demeke dirêj ji siyaseta ku hikumeta Şamê li ser gelên Sûriyê dimeşîne, gel careke din rabû ser piyan. Herî dawiyê di 20 Tebaxê de welatiyan parêzgeha Siwêdayê careke din rabûn ser piyan û banga guhertina sîstema desthilatdar kirin. Tişta ku herî zêde bala mirov dikşîne, silogan û bankartên ku ji aliyê xwepêşandanan ve tên bilindikirin.



Mînaka wê jî bilindkirina silogana 'Berxwedan Jiyan e', 'Xwîna Şehîd Hevrîn Xelef li Siwêdayê kulîlik dide' û 'Têk biçe hikumeta serdest'.

Têkildarî xwepêşandanên gel Siweydayê, nûnera Partiya Nûjeniya Dîmokratîk li Sûriyê, Heyfa Mehmûd ji rojnameya me re axivî.

### 'Divê gel destûrê nede hêzên derve ku destwerdana xwepêşandanan bike'

Heyfa Mehmûd diyar kir ku divê gelên Sûriyê xwepêşandanan ji mudaxeleya hêzên derve biparêzin û wiha got: "Gelên Sûriyê ji destpêkirina kirîzê ve rastî binpêkirinên zor hatine. Lewra îro gelên Sûriyê jî dixwazin vê hikumeta ku nikare bibe bersiv ji pirsgirêkên gel re, hilweşîne. Em tev dizanin ku rola gelê Siwêdayê di xwepêşandanên 2011'an de yên li dijî hikumetê çiqasî bibandor bûn. Wan li kêleka gelên herêmên din li dijî rêjîmê şoreşek dan destpêkirin. Lê ji ber ku ev şoreş ji destê gel derket û kete destê hêzên çeteyên girêdayî dagirkeran de , herwiha kete destê hêzên derve de, bi ser neket. Vaye dîsa gelê Siwêda dest bi şoreşa xwe ya 2'yem kirin. Ji bo ku careke din şoreşa wan têk neçe divê bi vîna xwe li dijî hikumeta Şamê derkevin. Herwiha nehêlin berjewndiyên derve û hêzên biyanî di vê şoreşê de mudaxeleyê bikin. "




### 'Em destekê didin xwepêşandanên Siwêdayê'

Nûnenera Partiya Nûjeniyê Heyfa Mehmûd da zanîn ku ew piştgiriya xwepêşandanên Siwêdayê dikin û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Em weke partiyên siyasî yên bakur û rojhilatê Sûriyê xwepêşandanên ku li Siwêdayê çêdibin, dişopînin. Xwesteka gelên Siwêda jiyaneke bi rumet û azad e, herwiha têkbirina hikumeta Şamê ya desthilatdar e. Hikumeta Şamê îro dixwaze rewşa Sûriyê vegere weke berî sala 2011'an, lewra tişta ku ji gelên Sûriyê tê xwestin, piştgirya van xwepêşandan ye. Rengê jiyana Netewa Demukratîk ya gelên di bin sîwana Rêveberiya Xweser de dijîn, îro bala wan kesên ku derketine xwepêşandanan, kişandiye. Ew dixwazin ev sîstem li cem wan jî pêk were. Em weke Partiya Nûjeniya Demokratîk piştigriyê didin vê şoreşê. Li nik vê jî em dibêjin rengê jiyana ku li bakur û rojhilatê Sûriyê heyî, ji bo hemû gelên Sûriyê şêweyê jiyana azad û demukrat e."

## FENER



### QSD`ê gerantorê aramî û aşitiya herêmî ye

**Idrîs Henan**

Çendîn dengê serhildana li başûçurê Sûriyê, Siwêda, bilind bibe, ewqas zirezira rêbir, bazirganên narkotîkê, milîsên nijadperest û koma Astaniyan li rojhilatê Sûriyê bilind dibe. Rejîma jihalketî ya Şamê bi piştgiriya alav û dûvikên Îranê yên kirêgirtî, Tirkiyê û çeteyên wê yên DAIŞ'ê bi pîroziya Rûsyayê, hewl didin tevlîheviyeke ku bi kêmanî pozisyona heyî biparêze, ava bikin. Ew baş têgihaştine ku projeya wan li Sûriyê têk çûye û ti şansê xwe yê vejandinê jî nemaye. Lew re; hewl didin li ser şopa dagirkeriya Tirk û bi şêwra wê pratîkê dubare bikin ku hinek destkeftiyên vir de wir de bi dest bixin. Lê çawa ku Tirkiyê nekarî bi wan siyasetên durû ti qezencan bi dest bixe û prestîja xwe wenda kir, dê heman çarenûs li benda fitnecî û sorkerên şerê nijadperest li rojhilatê Sûriyê be.

Îroj Hêzên Sûriya Demokratîk QSD'ê li rojhilatê Sûriyê – Dêrazorê – li hemberî vê hişmendiyê li ber xwe dide û li beramberî odeyên şerê taybet ên faşîzma Tik û DAIŞ'ê, odeyên çalakiyên hevbeş navbera rejîma Baas, Îran û Rûsyayê de, rêbir û milîsên kurtêlxwar, têkoşîneke dîrokî dide meşandin.

Plana wan ew bû ku kurtêlxwarekî ji hundirê QSD'ê bidin livandin û weke hespê Troy derbekê li projeya demokratîk a gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bidin. Hişyarî, bawerî, têgihaştin û esaleta gel, êl û eşîrên herêmê rê li ber vê plana qirêj girtin ku hemû pêkhate û çalakiyên gelêrî, çandî û civakî li gorî asta berpirsiyariyên xwe yên dîrokî tevgeriyan û ji bo parastina destkeftiyên Şoreşê, li dora berjewendiya neteweyî ya giştî bûn xelekek ji agir.

Tevî ku haya Rêveberiya Xweser û hêzên Sûriyeya Demokratîk QSD'ê ji liv û tevgera qirêj a rejîma Baas û Îranê li herêmê hebû, lê her tim dixwestin istiqrara li herêmê bi rêya nîqaş û têgihaştinan biparêzin ku aramiya herêmê bixin gerantiyê. Dibe ku bersiv dereng mabe jî, lê muheqeq ewlehî û aşîtiya civakî ya sivîl xeta sor a rêveberiyê ye ku hemû di oxira wê de têdikoşin. Lê dîsa jî, hindî bersiv hatiye dayîn, gereke dirêj neke ku plana hemû derdoran têk biçe.

Tevî ku Tirkiye ji aliyê cografîk ve dûrî saheya şere û nikare rasterast piştgiriya çek û cebilxanê bide, lê bê guman dê bi rêya Îran û rejîma Sûrî wê yekê bike. Her çiqasî Hêzên Sûriyeya Demokratîk QSD'ê, ku kilîta ewlehî û aşîtiya Sûriyê û herêmê ne, plana li Dêrazorê di zûtirîn dem de têk bibin, wê şansê serkeftina serhildana li başurê Sûriyê – Siwêda – jî guncawtir bibe.

Di çarçoveya geşedan û pêşketinên li herêmê rû didin de, tevî gef û hewlên dijminatiyê yên faşîzma Tirk, Hêzên Sûriyeya Demokratîk QSD'ê ji bo tekûzkirina aramî, ewlehî, têkbirina şaneyên DAIŞ'ê û rêbirên girêdayî berjewendiyên nijadperest, li Dêrazorê dest bi oparasyona xwe ya "Xurtkirina Ewlehiyê" kir. Ji bo têkbirina projeya çareseriya demokratîk a gelan, hemû aliyên qaşo dijber (rejîma Sûrî û çeteyên Tirkiye), bi rêya fesadî, fîtne, derew û êrişên odeyên şerê taybet bûne yek enî û provakasyoneke kirêt a nijadperest bi rê ve dibin. Ji vê zêdetir jî; piştgiriya wan çete û rêbirên li rojhilatê Dêrazorê bi mal, çek û cebilxanê dikin.

Ji bona vê jî em dubare dibêjim; serkeftina QSD'ê li hember vê eniya dijberan, gelek girînge ku pêşeroja çareseriya kirîza Sûriyê û aşîtiya herêmî tayîn dike û hemû aliyan tûşî koşeya teng dike ku carek din li hesabên xwe vegerin û xeta teror û faşîzmê têk dibe.